*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (521) *06-07-2026*



### Cihê têkoşîna azadiya Kurdistanê di ramana nifşê "Z" de

**N. Adil Direxişanî**

Bê guman, cîhan di warên zanist, teknolojî û ragihandinê de bi lezeke bêhempa pêş dikeve. Her roj, kampaniyên mezin berhemên nû, şêwazên jiyanê yên nû û xewnên nû derdixin holê da ku bala nifşê ciwan bikişînin. Di cîhaneke wiha de, ciwanên îroyîn ji her demê bêtir rastî bijarteyên din tên, ji telefonên desta û hişê destkird ve bigire heya digîje şêwazê jiyanê, muzîkê, torên civakî û derfetên koçberiyê.

Dom» R:5




### Me ji ber şermezarkirina qetlîama Siwasê ya Madimakê ceza xwar, lê qatilan ceza nexwarin

**N. Xidir Üso**

Ez di sala 1980yê de, piştî darbeya leşkerî ji ber doza PDKT-KUKê hatim girtin. Min cezaya hefsa muebetê xwar. 13 sal di ser derba leşkerî 1980 re derbas bûbû. Dewleta Tirkîyeyê li Kurdistanê qaşo bi şerê bi PKK re civata Kurd ji hev dixist û ji nuhde kontrol dikir. Bi hezaran gund dişewitand, bi mîlyonan gundîyê kurd bi darê zorê dida koçberkirin.

Dom» R:9



### Qasimlo: Ji kesayetiyê ber bi mektebekê ve

**N. Şemal Terxîbî**

Dr. Ebdulrehman Qasimlo, sekreterê berê yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê û rêberê navdar ê gelê kurd, mîraseke giranbiha ya siyasî li pey xwe hişt. Ew di Şeva Yelda ya sala 1930 de li bajarê Urmiyê ji dayik bû. Di 13 ê Tîrmeha 1989 de, li Viyena paytexta Otrîşê, di encama fitwayeke siyasî-olî de ji aliyê sîstema dîktator û faşîst a Komara Îslamî ya Îranê ve hat şehîdkirin.

Dom» R:3




# Peyama spasî û pêzanîna Hizba Dêmokrat rû bi xelkê xebatkar ê Kurdistanê, azadîxwazan, hizb û aliyên siyasî yên Kurdistan û Îranê




Piştî şehîdbûna 6 pêşmergeyên qehremane Hizba Demokrat ku di dema bicîgihandina erkek siyasî û teşkîlatî de, ketine nav boseya hêzên Spaha Terorîst a Pasdarên û canê xwe di riya azadî û serbilindiya neteweya Kurd de gorî kirin, gelek peyam ji aliyê xelkê xebatkar ê Kurdistanê, azadîxwazên Îranê, hizb, rêxistin, aliyên siyasî, kesayetiyên neteweyî û medenî û sazî û dezgehên cuda cuda ve ji bo Hizba Demokrat hatin şandin.

Ev nîşandana hevxemiya berfireh, careke din nîşan da ku tawan û tepeseriya Komara Îslamî, ne tenê îradeya xebatkarên rêya azadiyê naşkîne, belku hevparî û hevdiliya navbera hemû qatên nava neteweya Kurd, azadîxwazên neteweyên bindest û dêmokratxwazên Îranê zêdetir û bihêztir dike.

Rêberî, pêşmerge, endam û alîgirên Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê, bi erkê ser milê xwe dizanin ku ji dil û can spasî û pêzanîna xwe pêşkêşî hemû wan hizb, rêxistin, alî, kesayetiyên siyasî û civakî, çalakvanên medenî, medya û hemû wan mirovên azad bikin ku bi şandina peyama sersaxiyê, ragehandina hevxemiyê, di xema ji destdana van xortên fîdakar ên neteweya Kurd de li rex me sekinîn û ligel malbata şehîdan, Hizba Demokrat û neteweya Kurd hevxemiya xwe diyar kirin.

Ev hevpişkiya biqedr, sermayeyeke giranbiha ye ji bo bihêzkirina xebata hevbeş li dijî sitemkarî, tepeserî û binpêkirina mafê neteweyan û azadîxwazan.

Bêguman, xwîna paqij a şehîdên rêya azadiyê, dê bibe çiraya rêya xebata neteweya Kurd. Ew rêya ku wan bi bawerî, fîdakarî û gernasî ve hilbijartibûn, bi îradeya bihêz a pêşmergeyan, endamên hizbê û pişgiriya tevger û xelkê Kurdistanê û hemû azadîxwazên rastîn dê berdewam be, û siyaseta teror, serkut û mîlîtarîzekirina Kurdistanê, ti carî nikare îradeya neteweya Kurd ji bo bidestxistina azadî, dêmokrasî û mafên neteweyî têk bibe.

**Yad û navê şehîdên rêya azadiyê herdem zindî be**
**Serkeve xebata neteweya Kurd û hemû neteweyên bindest**
**Sernixûn be rejîma terorîst a Komara Îslamî**

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**Navenda Peywendiyan**
**3ê Tîrmeha 2026 an**

# Mistefa Hîcrî: Rûxandina rêjîmê erk û berpirsiyariyeke giştî ye û girêdayî yekîtî û hevgirtina hemû azadîxwazên Îranê ye

**Kak Mistefa Hîcrî, Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê şeva şemiyê li ser yekşemiyê, 7ê Pûşperê di bernameya 'Meydan' a beşa farisî ya Dengê Amerîkayê de ragihand ku ew tiştê li herêmê rû dide, bingeha gelek guhertinên siyasî amade dike ku Îranê jî li xwe digire. Têgihîştina di navbera Amerîka û Îranê de, çi bigihîje rêkeftinê û çi têk biçe, dê guhertinên pir bingehîn li pey xwe bîne.**




Sekreterê Giştî yê Hizba Demokrat di bersiva wê pirsê de ku çima Hizba Demokrat di xwepêşandanên du salên borî de tevgereke meydanî nekiriye û çalakiyên wê tenê di ragihandina mangirtinê de sînordar bûne, got: Rast e me daxwaza serhildan û hatina ser şeqaman a xelkê Kurdistanê nekir, ji ber ku em piştrast bûn ku Komara Îslamî ya ku şikesteke giran ji Amerîka û Îsraîlê xwariye, dê tola şikestên xwe ji xelkê serhildayî ê Kurdistanê hilîne.

Me di demekê de ku Komara Îslamî di 18 û 19ê Befranbarê de bi hezaran kes li ser şeqaman li xwîn werdan, li Kurdistanê daxwaza mangirtinê kir û herî kêm ji sedî 80ê bajar û navçeyên Kurdistanê bersiva daxwaza me dan. Ji ber wê we digot em her bangeşeke raperîn û hatina ser şeqaman bidin, xelk dê werin lê belê pir bi tundî tên tepeserkirin û komkujkirin; tevî wê jî li hinek navçeyên Kurdistanê li Îlam û Kirmaşanê hinek nerazîbûn hebûn ku wekî hûn dizanin hatin tepeserkirin û şehîd û birîndarên me yên zêde jî hebûn.

Kak Mistefa Hîcrî di bersiva wê de ku hûn bi giranî hatin mûşekbaran kirin, lê tevî vê rewşê jî we ti berevaniyek ji xwe nekir, behsa wê kir ku li destpêka şer de pir dihate gotin ku Hizba Demokrat û hêzên kurdî mil bi milê Amerîka û Îsraîlê li dijî Komara Îslamî tên eniya şer. Rast e Hizba Demokrat di pêxema bidestxistina mafên xwe de li dijî Komara Îslamî di xebat û têkoşînê de ye, lê belê cewher û armanca xebata me cuda ye ji armanca wan welatên ku tevî rêjîmê di şer de bûn.

Piştî wê jî Îran tenê bi Kurdistanê rizgar nabe û rûxandina Komara Îslamî jî tenê erka xelkê Kurdistanê nîne. Rûxandina rêjîmê erk û berpirsiyariyeke giştî ye û girêdayî yekîtî û hevgirtina hemû azadîxwazên Îranê ye. Bêguman amadeyiya karê meydanî û pêşmergane ya me hebû, Kurdistan niştimana me ye û her gava ku em rewşê guncaw bibînin em ê vegerin.

Sekreterê Giştî yê Hizbê di bersiva wê pirsê de ku hûn hêzeke çekdar in û baweriya we bi xebata çekdarî jî maye, nexwe çima tevî ku zêdetirî 200 caran êrîş li ser we hatin kirin, we çekên xwe û hêza xwe ya pêşmerge bo berevaniyê bi kar neanî, ronî kir ku Hizba Demokrat şiyana bersivdana êrîşên dronî û mûşekî yên Komara Îslamî nîne, ji bilî wê ne tenê binkeyên Hizba Demokrat, belku Herêma Kurdistanê û welatên erebî jî ketin ber êrîşên mûşekî yên rêjîmê û bertekên wan jî her wekî ya me bû.

**Xo ger me bersiva êrîşên Komara Îslamî bi berteka pêşmerge li navxweyî welat de bida, dibe ku xelkê me bihata komkujkirin û Kurdistan jî ji aliyê rêjîmê ve kawil biba. Em zêdetirî 80 sal e nirx û bihayên giran bo xebata xwe didin û me nexwest xelkê me li navxweyî welat her bi tenê bin û her ew ji vê zêdetir ziyan û xesariyan bibînin.**

Kak Mistefa Hîcrî di bersiva wê pirsê de ku mayîna we li Herêma Kurdistanê çendîn çalakiyên we sînordar kiriye, veneşart ku rewşa mayîna Hizba Demokrat li Herêma Kurdistanê bûye sedema wê ku di du salên borî de rêkeftinnama ewlehî ya di navbera Tehran-Bexda-Hewlêrê de bi ser Hizba Demokrat de bê sepandin û li gorî wê peymana ku li hember hikûmeta Herêma Kurdistanê de heye, rê li şandina hêza pêşmerge bo Kurdistanê bê girtin.

Sekreterê Giştî yê Hizbê di beşeke din a hevpeyvînê de behsa wê kir ku xebata Hizba Demokrat û tevgera kurd xebateke piralî ye û bi rawestandina xebata pêşmerge û meydanî ev têkoşîn bi dawî nabe, wekî çawa em dibînin xelkê Kurdistanê tevî hemû tepeserî û givaşên ewlehî, birêkûpêktirîn civaka siyasî ne li beramberî navçeyên din ên Îranê û ew jî berhema xebat û hewldana hizbên siyasî yên Kurdistanê ye.


Lê belê niha ku Komara Îslamî bi binpêkirina rêkeftinnama ewlehî û peymanên xwe di êrîşên xwe yên bo ser hizbên siyasî û binke û baregehên wan de berdewam e, bêguman siyaset û berteka me û hizbên kurdî yên din ên hevpeyman dê guhertin li ser de werin.

Kak Mistefa Hîcrî di bersiva wê pirsê de ku xebata pêşmergane dikare bibe piştgira xebata medenî û girseyî, ragihand ku rast e Hizba Demokrat hêza pêşmerge ya çekdar heye, lê belê stratejiya Hizba Demokrat yekîtiya siyasî û bi pratîk tevî aliyên din ên Îranî ye di pêxema çêkirina alternatîfekê li dijî Komara Îslamî û ger ew xebat û têkoşîn aliyê pêşmergane bigire, dibe ku me negehîne wê armancê ku xebateke siyasî, medenî û cemawerî di asta seranserî de dikare bi dest bixe.

Di heman demê de em dizanin ku xebata çekdarî dibe sedema tepeserkirina zêdetir û xwînavîtir a tevgera kurd û xelkê Kurdistanê. Sekreterê Giştî yê Hizbê di bersivdana wê pirsê de ku gelo ev tenê dîtina we ye yan a hemû rêberiya hizbê ye, got ku di Hizba Demokrat de biryaran kesek bi tenê nade û hemû biryarên siyasî û giring di kongre û komîteya navendî de bi komî tên girtin û ev siyaseta niha jî bi komî biryar li ser hatiye girtin.

Kak Mistefa bi amajekirina bi wê ku dibe ku çaverêbûna xelkê Kurdistanê bi taybetî ciwanan piştî tevgera Jînayê bo xebata pêşmergane ya hizbê zêdetir bûbe, lê belê siyasetên rast û realîst ên hizbê ew têgihîştin û qenaet li cem wan jî çêkiriye û li gorî wê em dikarin bêjin pêgeha siyasî û cemawerî ya Hizba Demokrat ji ya caran jî bihêztir e.

# Qasimlo: Ji kesayetiyê ber bi mektebekê ve



N. Şemal Terxîbî



Dr. Ebdulrehman Qasimlo, sekreterê berê yê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê û rêberê navdar ê gelê kurd, mîraseke giranbiha ya siyasî li pey xwe hişt. Ew di Şeva Yelda ya sala 1930 de li bajarê Urmiyê ji dayik bû. Di 13 ê Tîrmeha 1989 de, li Viyena paytexta Otrîşê, di encama fitwayeke siyasî-olî de ji aliyê sîstema dîktator û faşîst a Komara Îslamî ya Îranê ve hat şehîdkirin.
Navê Dr. Qasimlo bi têgehên wekî dêmokrasî, Otonomî, Sosyalîzm, têkoşîna çekdarî û serxwebûna Hizbê ve girêdayî ye. Her kesê ku wî nas dike, rasterast van nirxan tîne bîra xwe.

**Têkiliya Dêmokrasî û Prsa Neteweyî**
Yek ji şakarên herî mezin ên ramanî yên Dr. Qasimlo, girêdana di navbera dêmokrasî û pirsa neteweyî de bû. Ew di wê baweriyê de bû ku ne dêmokrasî bêyî çareserkirina pirsa kurd watedar dibe, û ne jî pirsa kurd bêyî dêmokrasiyê çareser dibe. Siyaset û doktrîna wî di vê hevokê de kurt dibû: "Dêmokrasî ji bo Îranê û Otonomî ji bo Kurdistana Îranê."
Di sala 1980'yî de, dema ku hêzên çepên radîkal banga "dîktatoriya proletaryayê" dikirin, Qasimlo bersiv da wan û got: "Ez xeraptirîn dêmokrasiyê, ji çêtirîn dîktatoriyê bêtir dipejirînim."
Danielle Mîteran, hevjîna serkomarê berê yê Firansê, li ser wî gotibû: "Dr. Qasimlo bi belgeyan ji min re selmand ku dêmokrasî dikare bibe xala hevpar a me Firansî û Kurdan." Wekî çawa Nelson Mandela û têkoşîna li dijî apartheidê li Afrîkaya Başûr temamkerên hev in, li Kurdistanê jî dêmokrasî û Qasimlo du parçeyên ji hev veneqetiyandî ne.

**Dêmokrasiya Navxweyî û Rêberiya Bi-Kom**
Dêmokratîzekirina têkiliyên navxweyî yên PDKÎ'yê encama jêhatîbûna Qasimlo bû. Ew yekemîn rêberê kurd bû ku bi rêya hilbijartinên azad di kongre û pilînoman de wekî kesê yekem dihat hilbijartin. Ev prensîb di ti partiyeke din a çar parçeyên Kurdistanê de nedihat dîtin.
Berevajiyê gelek rêberên din, wî bawerî bi "rêberiya takkesî" nebû. Ew alîgirê rêberiya bi-kom bû. Di sala 1980'yî de li bajarê Mihabadê, dema ku xelkê dirûşma "Bijî Qasimlo" didan, wî ew rexne kirin û got: "Dirûşma 'Bijî Qasimlo' ne dirûşma me ye, dirûşma me 'Bijî Azadî, Bijî Kurdistan û Bijî Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê' ye."

Dema ku endamên Hizbê di ceribandina dêmokrasiyê de şaşitî dikirin, wî digot: "Heya ku em fêrî dêmokrasiyê bibin, divê em bedela wê jî bidin, ji ber ku niha em temrîna dêmokrasiyê dikin." Wezîrê Dewletê yê Firansê di bîranînên xwe de nivîsîbû ku terorkirina Qasimlo, xencerek bû ku li dilê dêmokrasiya nûbûyî ya Rojhilata Navîn hat xistin.

**Otonomî û Realîzma Siyasî**
Pêdagiriya Dr. Qasimlo li ser otonomiyê ji bo du sedeman bû:
Yekem: Wî dît ku rewşa dîrokî û siyasî ya Kurdistana Îranê ji parçeyên din (Iraq, Tirkiye û Sûriye) cuda ye. Wekî siyasetmedarekî têgeheştî, wî sînorên siyasî yên heyî bi şêwazekî realîst qebûl kiribûn.
Duhem: Cûreyê zilma neteweyî ya li Îranê li ser kurdan dihat meşandin, ji ya gelên din cuda bû, ji ber vê yekê çareseriya wê jî diviyabû cuda ba.
Herçend wî daxwaza otonomiyê dikir, lê ti carî baweriya xwe ya bi mafê çarenûsînê û avakirina dewleta kurdî nediveşart. Di sala 1980'yî de ji nûnerê Filistînê Hany El-Hesen re gotibû: "Em niha daxwaza otonomiyê dikin, lê heke têkoşîn dirêj û kûr bibe, kurd dê bifikirin li ser alternatîfên din."

**Sosyalîzma Dêmokratîk û Dîplomasî**
Dr. Qasimlo herçend rexne li sîstema "sosyalîzma heyî" (Bloka Rojhilat) digirt, lê sîstemeke sosyalîst ji ya kapîtalîst çêtir didît. Wî li dijî sosyalîstên klasîk ku bi hinceta antî-emperyalîzmê zilma neteweyî ya li Îranê paşguh dixistin û komunîstên tundrew ku tenê behsa şerê çînayetî dikirin rawesta. Siyaseta wî ya dawî, Sosyalîzma Dêmokratîk bû. Ji ber ramanên wî yên çep û bandorker, ew heya roja şehîdbûna xwe di lîsteya reş a CIA'yê de bû û riya çûna Amerîkayê nedidanê.

Qasimlo bingeha dîplomasiya kurdî ava kir. Wî bawer dikir ku yekîtiya navxweyî şertê sereke ye, lê piştgiriya dewletên mezin şertê pêwîst e. Wî karî piştgiriya dewleta Firansê bi dest bixe û PDKÎ bû yekemîn partiya kurdî ku ji aliyê dewleteke mezin ve bi fermî hat naskirin. Di bin rêberiya wî de, PDKÎ ligel Partiya Kar a Îsraîlê, bû duhemîn partiya Rojhilata Navîn ku bû endama Înternasyonala Sosyalîst.

Dr. Bêrnard Koşner (ku piştre bû wezîrê derve yê Firansê) li ser wî gotibû: "Qasimlo fêrî min kir ku ji bo çareseriya pirsa kurd, divê em ne tenê pişta xwe bi mafên mirovan girêdin, belku divê em şiyana xwe ya siyasî û dîplomatîk jî bi kar bînin."

**Têkoşîna Çekdarî Wekî Taktîk**
Dr. Qasimlo ji sala 1979 heta 1989'an fermandarê giştî yê hêzên pêşmerge yên PDKÎ'yê bû ku hejmara wan zêdetirî 12 hezar kes bûn. Ji bo wî, şerê çekdarî bersiveke rewa û bergirî bû li dijî êrîşên leşkerî yên rejîma Îranê. Berevajî rêxistinên çerîkî ku şerê çekdarî wekî "stratejî" didîtin, Qasimlo ew tenê wekî taktîkekî demkî dît ji bo amadekirina rêya aştî û diyaloga siyasî.

Tevî hemû hovîtiya pasdarên Îranê, wî ti carî rê neda ku têkoşîna pêşmerge bibe kiryarên terorîstî. Berevajî hin rêberên din ku îdiaya rêbertiya çar parçeyan dikirin û navê kurdan xistin lîsteyên terorê, Qasimlo rûmeta şerê rewa parast. Yasir Erefat li ser wî gotibû: "Qasimlo, rêberê kurdan, fermandariya şerê çekdarî kir lê dêmokratbûna xwe jî parast."
Wekî din, wî serxwebûna biryara siyasî ya Hizbê vegerand. Berî wî, PDKÎ perçebûyî bû û di bin bandora aliyên din de bû, lê wî Hizb kire hêza herî mezin a opozîsyona Îranê. Malpera Wîkîlîks eşkere kir ku: "Qasimlo yekane rêberê opozîsyonê bû ku her dema bixwesta dikaribû Sedam Husên bibîne, lê wî xwe ji wênegirtina bi Sedam re diparast." Wî exlaq anî nav siyasetê û siyaset wekî "hunera mumkin" pênase dikir.

**Qotabxana Qasimlo: Neteweperweriya Modêrn**
Rastiyek heye ku Dr. Qasimlo dehan salan ji serdemê xwe pêştir bû. Ramanên wî yên nûjen û hevgirtina doza neteweyî bi mafên mirovan re, ew ji hemû rêberên serdemê wî cuda dikir. Ew di asta navneteweyî de ligel rêberên wekî Willy Brandt (Almanya) û Nelson Mandela (Afrîkaya Başûr) dihat hesibandin. Wî pirsa kurd ji qalikê herêmî derxist û anî ser maseya Ewropayê.

Îro, piştî zêdetirî sê dehkan ji şehîdbûna wî, nifşekî nû û ronakbîr li Kurdistanê serî hildaye ku ramanên Qasimlo baştir fêm dikin. Ev nifş wî wekî pilan û projeyeke dîrokî ya temamnebûyî dibînin û bi şanazî jê re dibêjin "Bavê Neteweperweriya Modern a Kurdî". Ji bo vê nifşê, kurdayetiya bêyî dêmokrasî û azadiya takkesî, çemkekî populîst û bêbaha ye.

Ev bandor ne tenê di warê teorîk de ye, belê rijiyaye ser şeqamên Kurdistanê. Di xwepêşandanên salên dawî de, ciwanan di bin rewşa herî tunde ewlehiyê de dirûşma hevpar didan: "Qasimlo, Qasimlo, rêka te dirêjî heye...". Ev yek nîşan dide ku manifestoya wî, projeyeke zindî ya pêşerojê ye.

**Dibistana Qasimlo nûneratiya neteweperweriyeke stratejîk û dûrbîn dike ku li ser 3 stûnên bingehîn ava bûye:**
**1** - Sekularîzm (Cudakirina ol ji dewletê)
**2** -Modernîzm (Hevdem bûn ligel cîhana nû)
**3** -Demokrasî (Bawerî bi sindoqa dengdanê û mafê hevwelatiyê)
Ev sê stûn îro bûne nîşana hişyariya neteweyî ya bilind, tovê ku Qasimlo salan berê çandibû, îro şîn bûye.

# Şiroveya herifîna desthihatdariya reha di Îranê de



N. Serbest Urmiye

**Sindurûka xewleketinê û binaxkirina bê meşrûîyet**

Dîroka siyasî ya cîhanê gelek caran daye selimandin ku hêzên ku pişta xwe dispêrin zext, serkut kirin û çinekirina sîstimatîk a îradeya gelan, heta rojên dawî wêneyekî bihêz û pîroz ji pêkhateya xwe nîşan didin.

Lêbelê, rastiya nepenî û metirsîdar ji van rejîman re hingê eşkere dibe ku stûna sereke yan maziye pişta wan diherife.

Hatine kuştina Elî Xamneyî û nemana wî û merasimên binaxkirina wî, zêdetirî ji vê hindê ku bûyereke biyolojîk a sade be, xala werçerxanê ya hilweşîna yekcarekî ya meşrûîyet û nîşana xewleketina dîrokî ya zordareke sitemkar e.

**Xwe bi zor zanîna xeyalî û xweleketina bi rast**

Zordarê ku bi salan civak parvekiribû bi ser xwerûperestên desthilata pîroz û hemwelatiyên bêpar û blindest de û ji bo ragirtina xwe ji rijandina xwîna ciwanan bigire heya tepeserkirinê di tev qadên siyasî, civakî, … de, dest ji çi kiriyareke hov û dijî mirovahiyê nediparast, di dawiya rê de bi rastiyeke wiha tal re rû bi rû dibe. Mirin di sindirûka bêkes manê de.

« sindurûka xewleketinê » amajeyek e ji bo çarenûsa neçariyê ya desthilatekê ku ji serekaniya meşrûîyeta gel bêpar maye.

Binaxkirina sitemkarê ku destê wî bi xwîna xwepêşanderên welatparêz û azadîxwazên rastîn sor bûye, tu carî nikare bibe destaneke gelêrî; belkî rêreweke dest çêkirî, sar û sivik e ku ji tirsa vê çendê de ku neku hêza hirs û xezeba gel û civakê senaryoya fermî ya desthilatdariyê têk bide, ji aliyê paşmayiyên navenda desthilatê ve û di rewşeke bi temamî îzolekirî û ewlekarî de tê lidarxistin.




**Mirina bi şermezarî, tolhildana dîrokê ji dîktatoran e**

Di çanda siyasî de, şermezarbûn ji bo rêberekê ne bi wateya hejariya madî an nivîşkaniya laşê wî ye, belku tê wateya herifandina exlaqî, nefreta giştî û tirsiyan ji gelekê ye ku hikim bi ser de kiriye.

Sitemkarê ku rojekê ji rojên xwe bi destpêk û dawî û di şûna Xwedê de li ser erdê dizaî, heta piştî mirina xwe jî, wiha ji siya gel ditirse ku divê binaxkirina wî di bin sîbera tirs û çekên leşkerî de bimeşe.

**Mirina wiha, xuyatirîn şermezarî û rûreşiya siyasî ye. Dema ku mirina rêberekê li şûna ku bibe şîna rastîn a gelekê, hêviya azadiyê di dilê gel de xurt bike, karnameya wî berî ku biçe bin axê, di dadgeha dîrokê de hatiye mehkûmkirin.**

**karesata binaxkirina bê meşrûîyet**

Binaxkirina bê meşrûîyet, dê di paşerojê de, bibe bahozeke pirs û arişeyên aloz di pêkhateya siyasî ya Îranê de.

Parvebûna navenda hêz û desthilatê: Bi çûna kesê ku bi dehsalan hevsengî di navbera bandên mafyayî yên leşkerî, serkutkar û aborî de diparast, valahiyeke mezin di navenda rêberiya hêzê de çêdibe.

Hilweriyan û dest berdan a hêza berjewendîxwaz: parek ji hêzê ku tenê ji ber tirsê an berjewendiyên aborî girêdayî sîstemê bûn, bi dawîhatina hikmê hakimê sereke û nemana wî, dê riya xwe ji desthilatê veqetînin.

Nebûna kesên karîzma di sîstemê de: cîgirên ku li şûn de bên danîn, ne xwedî meşrûîyeta olî û mesebiya kevneşopperêz dibin û ne jî dikarin wê heybeta pûç ji nû ve ava bikin; di encamê de, desthilat neçar e ku bi rengekî saf û eşkere, tenê pala xwe bide hêza serkutê ku di cihê bixwe de temenê rejîmê pir kurt dike.



**Encam**

Ew sindurûka ku Xamneyî tê de hate danîn, ne sindurûka kesekî ye; belkû tabûta îdeolojiyeke tevahîxwaz, serkutkar û ji gel havîbûyekê ye ku bi dehsalan siya xwe avêtibû ser Îranê.

Binaxkirina wî di rewşa ewlekarî û ji tirsa serhildana gel de, nîşaneya dawiya çaxeke tarî û destpêka qonaxeke nû ye; rojên ku tê de neteweyên Îranê, li ser xewlehiya dîktatoriyê, ber bi selimandin û cihgîrkirina nasnameya neteweyî, azadî û serweriya yasayî ve dimeşin.

# Cihê têkoşîna azadiya Kurdistanê di ramana nifşê “Z” de



N. Adil Direxişanî
W. Hesen Mukerem



Bê guman, cîhan di warên zanist, teknolojî û ragihandinê de bi lezeke bêhempa pêş dikeve. Her roj, kampaniyên mezin berhemên nû, şêwazên jiyanê yên nû û xewnên nû derdixin holê da ku bala nifşê ciwan bikişînin.

Di cîhaneke wiha de, ciwanên îroyîn ji her demê bêtir rastî bijarteyên din tên, ji telefonên desta û hişê destkird ve bigire heya digîje şêwazê jiyanê, muzîkê, torên civakî û derfetên koçberiyê.

**Niha em li xortekî li yek ji bajarên Kurdistana Îranê binêrin.**

Mîna bi mîlyonan ciwanên din, wî jî bo pêşeroja xwe gelek xewn hene, xewn, ku hin ji wan şexsî û madî ne, perwerde, karekî baş, ewlehiya aborî, rêwîtî, serfirazî û jiyaneke bi kalîte.

Lê li kêleka van daxwazên takekesî, daxwazek jî heye ku rehên wê di dîrok û bîra kolektîf a civaka wî de hene, daxwazek ku nifşên li pey hev bi xwe re hilgirtine û hîn bersivek diyarker ji bo wê nedîtine, ke ev jî mafê diyarkirina çarenivîsê ye.

Pirsa bingehîn a vê gotarê li vir dest pê dike: Di cîhanekê de ku nifşê “Z” ji her nifşeke din bêtir bi teknolojiyê, globalîzasyonê û nirxên nû yên jiyanê ve girêdayî ye, têkoşîna azadiya Kurdistanê di hiş û pêşîniyên wan de çi cihek digire?
Ma ev armanc hîn jî beşek ji nasnameya siyasî û civakî ya nifşa nû ye, an wate û şêweya wê li gorî berê guheriye?
Ji bo bersiva vê pirsê, divê em pêşî jiyana rojane ya xortekî Kurd fêm bikin. Jiyana wî bi gelek awayan ji jiyana hevpîşeyên wî yên li deverên din ên cîhanê cuda ye.

Mîna her ciwanekî din, ew li pêşketin, kar, evîn, ewlehî û pêşerojek geştir digere, lê di heman demê de, ew bi rastiyên ku ji bo gelek ciwanên cîhanê nediyar in re rû bi rû dimîne.

Li hin deveran, kolberî hîn jî beşek ji rastiya jiyanê ye.
Gelek ciwan hîs dikin ku di navbera nasnameya wan a çandî û zimanî û pêkhateya fermî ya welêt de valahiyek heye.

Ew li malê zimanê xwe yê Dayîkê fêr dibin, lê perwerdehiya fermî bi zimanekî din dibînin. Ji aliyeke din ve, pirsgirêkên aborî, xîç û xarên bêdawî yên burokrasiyê û fikarên li ser pêşerojê jî beşek ji jiyana wan a rojane ne.
Lêbelê, eger kesek xeyal bike ku nifşa nû yê Kurdistanê nifşeke depresyon û bêhêvîtiyê ye, wî wêneyeke tevahî ya rastiyê pêşkêş nekiriye.

**Ciwanên Kurd, mîna ciwanên din ên cîhanê, ji jiyanê hez dikin.**



Muzîka Kurdî, dîlan, festîval, xweza, futbol, hevaltî û evîn hîn jî beşek girîng ji jiyana wan in. Ew bi rêya înternetê bi cîhanê ve girêdayî ne, muzîk di canê wan de diherike, ew teknolojiyê bi kar tînin û pêşerojek baştir ji bo xwe xeyal dikin.

Bi rastî, nifşa “Z” li Kurdistanê di navbera du cîhanan de dijî, ji aliyekî ve, cîhanek ku bi lez diguhere û derfetên nû pêşkêş dike, û ji aliyê din ve, rastiyên civakî û dîrokî ku bandorê li jiyana wan dikin.

Pirsa sereke ew e ku, di rewşeke wiha de, gelo têkoşîna azadiya Kurdistanê hîn jî ji bo nifşê nû serekî ye? An jî ev nifş ji her tiştî bêtir li avakirina pêşeroja xwe ya kesane digerin?

**Wisa xuya dike ku bersiva vê pirsê ne “erê” û ne jî “na”yeke sade ye.**

Nifşê nû, berevajî nifşên berê, nasname û azadiyê li pêş jiyanê naxe. Naxwaze di navbera pêşeroja xwe ya şexsî û pêşeroja civaka xwe de hilbijêre. Herduyan jî dixwaze, di rastiyê de, derfeta jiyaneke baştir û serbilindiyê di parastina ziman, çand, rûmet û mafê biryardana çarenivîsa xwe de dikare pêvajoyeke dil şikestî be.

**Belkî ji ber vê yekê ye ku têgeha têkoşînê di hişê vê nifşê de jî diguhere.**
Ji ber vê yekê, ger tevgera siyasî ya Kurd bixwaze bi kûrahî bi Nifşa “Z” ve girêdayî bibe, tenê xwe dispêre bîranînên berê, bes nabe. Ev nifş dixwaze bizanibe ku Kurdistaneke rizgarkirî dê çi guhertinekê li ser jiyana wan a rastîn de bîne, dê çi bandorê li ser perwerde, aborî, kar, azadiyên kesane, dadperwerî û pêşeroja wan bike.

Belkî taybetmendiya herî girîng a Nifşê “Z” ew e ku ew armanc xwaz e, lê di heman demê de ew li ser encamê jî disekine. Ew derbasiyê ji bîr nake, lê ew pêşerojê ji bo derbasiyê fîda nake. Ji ber vê sedemê, divê pêvajoyek were afirandin ku efsane (Pêşmerge) bikaribin li kolanên Kurdistanê bigerin da ku rûmeta îradeya neteweyekê di dilê ciwanan de ji nû ve biafirînin.

# Ji Nû Ve Nasandina Têkoşîna Kurdî di Serdema Guherînên Mezin de



N. Dr. Mehmûd Ebas



**Beşa Duyem**

**Ji şoreşa klasîk ber bi pevçûnên serdema guhertina ve**

Gelê Kurd îro ne hewce ye ku dadperweriya doza xwe ji nû ve bipîve, ne jî hewce ye ku ji mafê xwe yê neteweyî, an ji xewna xwe ya dîrokî ya Kurdistaneke yekgirtî û azad paşve vegere. Ewa ku îro pêdivî ye, ew e ku rê û amûrên xebatê ji nû ve bên nirxandin, da ku bi cîhaneke nû re biguncin, cîhaneke ku tê de rêgezên hêz û bandorê guherîne.

**Mafê neteweyî yê Kurdî ne cihê gotûbêjê ye**

Hebûna Kurdistanê, yekbûna gelê wê, mafê çarenivîsê û avakirina dewleta xwe, ne mijar in ku bi şêwazên hizrî yên nezelal bên guhertin, bi taybetî di herêmekê da ku desthilatên wê hê jî hebûna Kurdan înkar dikin û wan wek metirsiyekê dibînin ku divê bê parçekirin an kontrolkirin. Ji ber vê yekê, pêşxistina xebata Kurdî nayê wateya sivikkirina armanca neteweyî, lê wateya parastina wê bi rêbazên pêgihîştîtir û karîgertir e.

Di sedsala borî de, piraniya tevgerên neteweyî li ser mantiqeke diyar ava bûn: gelekî ji mafên xwe bêpar, nasnameya xwe pêk tîne, rêxistinên xwe ava dike, paşê jî li hember desthilateke navendî an hêzeke dagîrker têdikoşe da ku naskirin an serxwebûnê bi dest bixe. Tevgera Kurdî jî, ji şoreşên Şêx Ubeydullahê Nehrî, Şêx Seîd, Barzaniyan, heta Ebdulrehman Qasimlo, PKK, û xebata siyasî û çandî li parçeyên Kurdistanê, gelek caran di vê çarçoveyê da meşiya. Têkoşîna siyasî an leşkerî bû navenda karê neteweyî.

Ev rêyekî dîrokî bû û sedemên xwe hebûn. Cîhan wê demê bi dewletên neteweyî yên hişk, bi mantiqa Şerê Sar, û bi pîvana berxwedan û rêxistinbûnê dihat fêmkirin. Lê pirsgirêka îro ne ew e ku ew rêya dîrokî şaş bû, pirsgirêk ew e ku em bibêjin amûrên wê yên kevn hê jî ji bo serdemeke nû têra xwe dikin. Sedsala 21an tenê amûrên ragihandinê û aboriyê neguherand, belku wateya hêzê bi xwe ji nû ve pênase kir. Bi şoreşa dijîtal, aboriya cîhanî, zîrekiya çêkirî, û teknolojiyên guhertinê, kontrolkirina datayan, rêvebirina agahiyan, çêkirina raya giştî, û destgirtina ser aborî û teknolojiyê bûn hêmanên sereke yên bandor û desthilatê. Em ketine serdema pevçûnên guhertinê, li vir şer tenê li eniyên leşkerî an odeyên siyasetê nayên biryar dan, belku li ser platforman, toran, bazaran, guhertinan û navendên teknolojiyê jî têne biryar dan.

Ji ber vê yekê, pirsa Kurdî êdî tenê di çarçoveya rûbirûbûna bi desthilata navendî da namîne.Ew niha girêdayî ye bi vê yekê ku çawa doza Kurdî dikare xwe di vê cîhana nû da ji nû ve bicih bike bêyî ku nasname û armanca xwe winda bike. Pêdivî ne ew e ku doza Kurdî ji rastiya xwe ya dîrokî dûr bikeve da ku zimanê serdemê razî bike, pêdivî ew e ku zimanê serdemê baş fêr bibe da ku xizmeta wê rastiyê bike.

Beşek girîng ji karê siyasî yê Kurdî hê jî bi hişmendiya sedsala borî dimeşe, partî hin caran dişibin rêxistinên veşartî yên kevn, û gotara siyasî bi têgihiştinên hêdî û kevin li cîhaneke pir lezgîn dinihêre. Ev nayê wateya ku ezmûna Kurdî di dîrokê da şaş bû, wateya wê ew e ku rêzgirtina rast ji wan qurbaniyan, pêşxistina amûran e, ne dubarekirina wan bi rengekî hişk.

Girêdana bi netewetiya Kurdî nayê wateya hişkbûna di rêbazan da. Heta dibe ku girêdana bi amûrên kevn, dema şertên cîhanê diguherin, doza bi xwe jî lawaz bike. Pêdivî ne derketina ji netewetiya Kurdî ye, lê veguhastina projeya neteweyî ya Kurdî ye ji mantiqa sedsala borî bo amûrên vê sedsalê.

Li Rojavayê Kurdistanê, di salên dawî da ezmûneke siyasî, rêveberî û leşkerî derket holê ku di destpêkê da wek deriyekî nû ji bo Kurdan li Sûriyê xuya dikir. Wê di nav hawîrdoreke aloz da astek ji ewlehî û parastinê peyda kir, lê nekarî vê yekê veguherîne projeyeke neteweyî ya qewî ku xizmeta doza Kurdî ya dîrokî bike. Rast e ku zextên navneteweyî, dijminatiya hêzên herêmî, û alozîyên şerê Sûriyê bandor li wê kirin, lê ev wê ji berpirsyariya paşguhkirina aliyê neteweyî, lawaziya binesaziyê, başnekirina jiyana rojane, û neavakirina modêleke aborî û sazûmanî ku hebûna Kurdan li ser axa wan bihêz bike, rizgar nake.

Bi guherînên dawî yên Sûriyê, û bi windakirina beşek ji destkeftiyên rêveberiya xweser, tevgera Kurdî ket qonaxekê ku êdî ne li ber projeya firehbûnê ye, lê li ber hewldana dijwar a parastina tiştê mayî ye, bi rêya diyalog û danûstandinê di nav Sûriyeke guherbar da. Êdî bes nîne mirov tenê bi zimanê serkeftina leşkerî an rewayetiya meydanê biaxive. Rastiya nû nîşan da ku çek û rêveberiya herêmî, ger piştgirîya dîtineke neteweyî ya zelal, aboriyeke rast, û başkirineke berbiçav di jiyana xelkê da tune be, dikarin bi yek guhertina hevsengiya hêzan lawaz bibin.

Îro ya ku pêdivî ye, ev e ku tevgera Kurdî ji mantiqa tevgera şoreşgerî ya kevn derbasî mantiqa hêzeke neteweyî ya dîrokî bibe, hêzek ku bikare di cîhaneke, girêdayî û lezguher da kar bike. Ev nayê wateya devjêberdana ji bingehê doze, lê wateya rizgarkirina wê ji hişkbûnê û dayîna hêzeke mezintir a amadebûn, bandor û domandinê ye.

Doza Kurdî ne ji dîrokê, ne ji qurbanîyan, û ne ji kûrahiya zordariyê bêpar e. Lê îro pêdivîya wê bi dîsa bicihkirina xwe di hevsengiyên serdemê da heye. Gelê Kurd ne hewce ye ku kesekî armanca wî ya neteweyî sivik bike, ew hewce ye ku alîkariyê bike da ku ev armanc bibe projeyeke jiyanbar di pergala navneteweyî ya nû da. Ew ne hewce ye bi dirûşmeyên serneteweyî yên nekarîn parastina gelekî bindest li Rojhilata Navîn bikin, lê hewce ye bi gotarekê ku eşkere dibêje: bi netewetiya xwe ve girêdayî bimîne, lê rêbazên parastina wê nû bike.

**Ji vir, erkê herî lezgîn li pêş tevgera Kurdistanî ew e ku gotûbêjeke cidî û kûr li ser vê veguhastinê veke, gotûbêjek ku rewşenbîr, siyasetvan, lêkoler û xwedî ezmûn tê de beşdar bibin, da ku li ser pêşeroja doza Kurdî bi zimanekî ku cîhana nû fêm dike, bêyî devjêberdana ji bingehên mezin, bihizirin.**

Şerê bê ne tenê şerê sînoran û erdnîgariyê ye, belku dibe şerê cih û pêgehê be di cîhaneke nû da ku niha tê çêkirin. Yê ku vê cîhanê baş nexwîne, dibe ku ji hevsengiyên wê derkeve, çiqas dîrokeke dirêj a xebatê jî hebe. Lê yê ku karibe li ser armanca neteweyî bi hêz bimîne û di rêbazan da nerm û nûjen be, ew dikare baştir doza Kurdî biparêze, hebûna wê bihêz bike, û wê nêzîktir bike bo mafê wê yê dîrokî: azadî, dewlet û yekîtî.

**Dê bidome...**

## Nerîna Lîderan



**"Mistefa Hîcrî":**

**"Rûxandina rêjîmê erk û berpirsiyariyeke giştî ye û girêdayî yekîtî û hevgirtina hemû azadîxwazên Îranê ye."**



**"Hesen Şerefî":**

**" Kurd li Îranê bedela pêgihîştina xwe ya siyasî didin"**



**"Israel Katz":**

**" Heçî rêberekî Komara Îslamî ku ji bo jinavbirina Îsraîlê gavekê bavêje û gefan li Îsraîl bike, dê bibe armanc û ji nav biçe.**



**"Donald Trump:**

**"Em neteweya herî bihêz in, me rêjîma Îranê têk bir"**

# Têkbirina sîstmatîk a jîngeha Kurdistanê ji aliyê rêjîma Îranê ve



N. Eskender Ceiferî



Di salên dawî de, mijara parastina jîngehê li Kurdistanê bûye yek ji fikarên herî girîng ên çalakvanên jîngehê. Li gor çalakvan û komên parêzvanên xwezayê, rêjîma Îranê bi polîtîka û kiryarên cûda, zirarên berfireh gihandine daristan, çavkaniyên avê, jiyana ajelên kovî û çiya û ekosîstma Kurdistanê. Ew di vê baweriyê de neîmku ev rûxandin bi hilkeft nîn e, belku beşek ji pêvajoyeke sîstmatîk in ku pêşeroja xwezaya vê herêmê dixe bin metirsiyê.

Yek ji fikarên herî girîng, pêkanîna opêrasyonên leşkerî li herêmên daristanî yên Kurdistanê ne.
Çalakvanên jîngehê dibêjin ku rêjîma Îranê gelek caran li herêmên çiyayî û daristanên Kurdistanê opêrasyonên leşkerî encam dane ku di encamê de, beşên berfireh ji daristanan rastî şewatê hatine.

Şewatên dubarebûyî ne tenê bi hezaran dar ji nav birine, belku jîngeha gelek ajalan jî têk biriye. Daristanên Kurdistanê ku ji sermayeyên xwezayî yên herî girîng ên vê herêmê tên hesibandin, di encama van bûyeran de zirarên giran dîtine.

Li gor çalakvanan, zirar ne tenê bi daristanan ve sînordar in. Têkbirin û xetimandina axê, ji nav çûna rûbera giya û kêmkirina cihêrengiya biyolojîk ji encamên din in ku ji ber vê pêvajoyê rû dane. Gelek cureyên ajalan ku bi salan li van herêman dijiyan, ji ber jinavçûna jîngehên xwe yên xwezayî an hatine kuştin an jî neçar mane ku cihê jiyana xwe çol bikin. Ev mijar hevsengiya xwezayî ya êkosîstmê jî bi metirsiyê re rûbûrû kiriye.

Ji mijarên din ku çalakvan balê dikişînin ser, mijara çavkaniyên avê ye. Ew di vê baweriyê de ne ku rêjîma Îranê bi polîtîkayên xwe çavkaniyên ava Kurdistanê xistiye bin meyirsiyê û li hinek herêman, av bi şêwazekî tê birêvebirin an veguhastin ku li Kurdistanê encamên nerênî ji jîngeh û jiyana mirovan re tîne. Kêmkirina çavkaniyên avê ji bilî bandora li ser çandiniyê, jiyana giya û ajalan jî dixe bin metirsiyê û egera hişkesalî û şewatê zêde dike.

**Çalakvanên jîngehê herweha dibêjin: dema ku şewat çê dibin, jîngeparêz û xelk rûbûrûyî astengiyên pirhejmar dibin. Li gor gotina wan, rêjîma Îranê destûrê nade ku çalakvan bi hêsanî ji bo vemirandina agir bikevin herêmên zirardîtî. Herweha amûr û kelûpelên pêwîst ji bo kontrolkirina agir nakeve ber destê wan. Herwisa hinek ji jîngeparêzan bi sînordarkirin û guşarên ewlehiyê re rûbûrû dibin.**

Nebûna hevkariyê û rêgirtin li pişkdariya xelkê dibe sedem ku şewat ji bo demeke dirêjtir berdewam bikin û zirarek mezin bigihîje daristanan.

Yek ji mijarên din ên ku tê ziman, rêgirtina li çandina şitilan û nûkirina daristanên zirar-dîtî ye. Xelk û çalakvanên jîngehê, ji wan jî bizava "Zagrosane", hewl dane ku bi çandina şitil û tovan, beşek ji zirarên ku gihane daristanên Kurdistanê, qerebû bikin.

Lê li gor gotina wan, rêjîma Îranê rê li ber pêkanîna van çalakiyan girtiye û destûr nedaye ku projeyên nûkirina xwezayê bi şêwazekî bibandor berdewam bikin. Ev kiryar, pêvajoya nûkirina daristanan bi pirsgirêkên giran re rûbûrû kiriye.

Daristanên Kurdistanê, wekî yek ji êkosîstmên herî girîng ên Rojhilata Navîn tên hesibandin. Ev daristan xwedî roleke bingehîn di parastina cihêrengiya biyolojîk, rêgirtina li şuştina axê, hilberandina oksîjênê, embarkirina avê û kêmkirina bandorên guhertina rewşa seqayê de ne.

Jinavçûna van daristanan ne tenê pirsgirêkek herêmî ye, belku encamên wê dikarin bandorê li ser jîngeha herêmên berfireh li Rojhilata Navîn bikin. Ji ber vê yekê, parastina jîngeha Kurdistanê berpirsiyariyek hevpar e ji bo hemû kesên ku giringiyê didin pêşeroja jîngeha cîhanê.

Çalakvanên jîngehê tekez dikin ku parastina xwezayê bêyî pişkdariya xelkê, dijwar e. Ew ji welatiyan, rêxistinên sivîl û saziyên jîngehê dixwazin ku li kêleka hev ji bo parastina daristan, çavkaniyên avê û jiyana ajalên kovî li Kurdistanê tev bigerin.

Herweha li ser pêwîstiya piştgiriya xwebexşan, dabînkirina amûrên pêwîst ji bo kontrolkirina şewatan û afirandina mercên pêwîst ji bo pêkanîna projeyên çandinê li daristanan tekez dikin.

Eskender Ceiferî: Bi baweriya van çalakvanan, tiştê ku îro li Kurdistanê diqewime, ne tenê rûxandina çend herêmên daristanî ye, belku metirsiyek cidî ye li dijî pêşeroja jîngehê, tenduristiya mirovan û cihêrengiya biyolojîk a herêmê.

Berdewamiya vê pêvajoyê dikare zirarên ku nayên qerebûkirin ji bo nifşên pêşerojê bîne. Ji ber vê yekê, ew daxwaza baldarbûna zêdetir a raya giştî, ragihandin û saziyên parêzvanên jîngehê dikin.

Li gor baweriya wan, parastina xwezayê divê derveyî mijarên siyasî û ewlehiyê be. Parastina daristanan, çavkaniyên avê, jiyana hov û êkosîstmên xwezayî, mercê bingehîn ji bo geşepêdana domdar û pêşerojeke tendirust ji bo Kurdistanê ye.

# Di deve deva 22ê Pûşperê, Salroja Şehîdkirina Dr. Ebdullrehiman Qasimlo li ser hizir û ramanên Qasimlo, me digel rêzdar "Mesûd Tek" Siyasetmedarê naskiriye Kurd hevpeyvîn encam daye.



**Hevpeyvîn.rêzdar "Mesûd Tek"**
**Hevpeyvînkar. Sîmîn Rûhanîzade**

Mesûd Tek, di beşek gotinên xwe de dibêje: "Li asta Îranê da jî Qasimlo nirx û bihayên dêmokrasî, mafê jinan û mafê diyar kirina çarenusî cuda nedikir û her tim digot "azad kirina Kurdistanê bi hêztirin piştgirî ye bo xebata demokrasî û azadiyê", Hertim dixwast Hizba Dêmokrat ligel hêzên dêmokratik a Îranê pêyvendiyeka baş û dostanî hebê".



**1. Dr.Ebdulrehiman Qasimlo herî zêde bi kîjan taybetmendiyên xwe tê nasîn, karîzma, hizir û raman, dîplomasî an jî rêberî? Sedema zindîmana nav û rêbaza wî çi bû?**
Şehîd Dr. Qasimlo sercemê teybetmendiyên han hebûn. Di birurayê Kurdistanê da weki "mamostayê dêmokrasî û diplomasî" tê nasin.
Şehîd Qasimlo bi nivisina namilkeyê "Kurtebahsek Li Ser Sosyalizmê" ve, nişan daye, ku mamostayê hizir û ramanê ye.
Herweki dizanin piştî têkçona Komara Kurdistanê, Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê tuşî qeyrana nasnameyî bibû. Şehîd Qasimlo ev kes bû, ku bi hewl û xebata xwe veHizba Dêmokrat kire hizbekî netewî û dêmokratik.
Şehîd Qasimlo ligel hevsengerên xwe, paş agirbesta şerê Îran-Iraqê, rê û xetûmeşek a guncav ligel rewşa nû daniye, ku HDK-Î îro jî li ser vê xetûmeşê dimeşe û ev yêka diselmîne, ku Şehid Qasimlo rêberekî zana û micid û gernas e.
Ji bo min taybetmendiyeka here girîng a Qasimlo, xakî bûna wî bû. Min tu caran pêkenina wî ji bîr nekiriye û nakim...

**2. Qasimlo dêmokrasî, mafên jinan û mafê diyarkirina çarenûsê ji hev cuda nedidît. Ev nêrîn îro di nav opozîsyona Îranê û qada siyasî ya Îranê de di çi astekê de ye?**
Belê Şehîd Qasimlo gelek girîngî dida nirx û bihayên, ku cenabê te behs kiriye û wan ji hev cuda nedikir. Her tim digot "Kurdistana otonom da jin xwediyê mafê yeksan dibe, sistema dêmokratik a pirreng û pirdeng tê ava kirinê."
Heyamekê di hemû binke û barigehên HDK-Î da tobloyek hatibû daliqandin, ku têda binameyên dêmokrasî hebûn û digot, ku divê kadr û pêşmergeyên HDK-Î pabendî binameyên hanê bibin û wekî sîmaya dêmokrat peyrev bikin.
Belê, li asta Îranê da jî Qasimlo nirx û bihayên dêmokrasî, mafê jinan û mafê diyar kirina çarenusî cuda nedikir û her tim digot "azad kirina Kurdistanê bi hêztirîn piştgirî ye bo xebata dêmokrasî û azadiyê". Hertim dixwast HDK-Î ligel hêzên dêmokratik a Îranê pêyvendiyeka baş û dostane hebê û bona vê armancê gelek hewl da û fidakarî kir, ku ez şahidê vê yêkê me.
Ligel evê yêkê jî Şehîd Qasimlo tu caran xebata neteweyî a gelê Kurd bi xebata giştî a Îranê ve girênedida. Hêzên dêmokrat a Îranê hatibûn tepeserkirinê xebata azadî û dêmokrasî gelek lawaz bibû, hinek hêzên opozisyonê piştgirî li rejima Axundan dikir, lê belê li Kurdistanê xebata azadî her berdewam bû.
Ez baş û bi hurgiliyê rewşa siyasî û peyvendiya hêzên Kurdisatanê bi opozisyona Îranê nizanim. Lê belê qasê, ku dibinin pêyvendiya dêmokrasî, mafên jinan û mafê diyarkirina çarenûsê li Îranê di asta here nizm da ye, ku berpirsê vê yekê ne nirxên hanê ne, tênegihiştina opozisyona Îranê ye. Bi gotineka dinê rewşa opozisyona Îranê a îro, qiymeta nirxên hanê kêmtir nake.

**3. Piştî zêdetirî sê dehikan ji terora Dr. Qasimlo li Viyanayê derbas bûye, çima ev dosiye heta îro negihîştiye encamekê? Ev bûyer çi bandor li ser helwesta Ewropayê li hember terorîzma derveyî sînor a Komara Îslamî ya Îranê danaye?**
Ji ber ku li ba dewletên Ewropî, bi taybetî jî li ba dewleta Otrîşê, her tim berjewendî girîng e ne maf û azadiyên dêmokratik. Rast e di heyama germayiya bûyerê da, dewletên Ewropî li dijî rejima Îranê halwest nişan dan, bo demekê pêyvendiyên xwe ligel Îranê sist kirin, dorpêça aborî û siyasî li ser rejima Îranê danin. Ev helwest bûye sedemek ji sedeman, ku cinayetên siyasî a rejimê li derveyî sînor kêmtir be.

Gotineka Mela Mistefa Barzanî heye, ku dibêje "li ba dewletan, bermilek neft ji bermilek maf û edalet û azadiyê bihatir e." Ku, siyaseta Kurdistanê divê gotina hanê a Barzanî hertim li ber çavê xwe bigre.

**4. Raman û rêbaza xebata siyasî ya Dr. Qasimlo heta çi qasekê di stratejî û gotara siyasî ya îroyîn a tevgera rizgarîxwaziya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê de berdewam e?**
Bê guman raman û rêbaza Şehîd Qasimlo li ser rêxistinên dinê yên Rojhilatê Kurdistanê, bi taybetî yên di warê hevkarî û hevxebata hêzên welatparêz û giringiya dêmokrasiyê da hebûye û heye, lê heta çi qasekê ye, agadar ninim.

Lê baş dizanim, ku HDK-Î, hevsengerên Şehîd Qasimlo li ser xet û meşên, ku ew bi xwe daniye dimeşin. Helbet siruştî ye, ku ligel guhartina rewşê, hinek helwest û gotara siyasî yên HDK-Î bêne guhartin, lê areste herweki xwe maye.

**5. Yek ji taybetmendiyên Qasimlo hewldana girêdana pirsgirêka Kurdistanê bi dêmokrasiyê li hemû Îranê bû. Ev nêrîn îro di pêwendiya di navbera partiyên Kurdistanê û opozîsyona Îranê de çi cih û girîngî heye?**
Şehid Qasimlo her tim li ser pêyvendiya tekoşina azadiya Kurdistanê û xebata dêmokrasiyê Îranê tekezî dikir û bona vê armancê jî hewl dida. Lê belê herwekî min li jorê jî got, têkoşîna azadiya Kurdistanê bi xebata dêmokrasî û azadiya seranserê Îranê ve girênedida. Her tim digot "hazar dost kêm e, dijminek zêde ye" û bi vê gotinê tevdigeriya hewl dida dostên Kurdan pir, dijminê Kurdan kêm be.

Ji bername û gotara Hevpeymaniya Hêzên Siyasî yên Kurdistana Îranê xuya ye, ku bîr û ramana Qasimlo a derheqa pêyvendiya tevgera Kurd li gel opoziyona Îranê, kêm an zêde, bandor li ser rêxistinê din yên welatparêzê Rojhilatê Kurdistanê daniye, ku ev yêka girîng e û nişana mezinahiya Şehîd Qasimlo ye.

Di dawiyê de divê bêjim, ku yek ji şanaziya min ev e, ku min Qasimlo naskir û pêra giftugo û sohbet kir.


**Ruhê wî û hemu şehidên Kurdistanê şad, rêbaza wan berdewam be.**
**Gelek spas bo gotubêja hanê.**

**Gelek spad bo rêzdar Mesûd Tek Siyasetmedarê naskiriye Kurd.**

# Me ji ber şermezarkirina qetlîama Siwasê ya Madimakê ceza xwar, lê qatilan ceza nexwarin



N. Xidir Ûso



Ez di sala 1980yê de, piştî darbeya leşkerî ji ber doza PDKT-KUKê hatim girtin. Min cezaya hefsa muebetê xwar.

13 sal di ser derba leşkerî 1980 re derbas bûbû. Dewleta Tirkîyeyê li Kurdistanê qaşo bi şerê bi PKK re civata Kurd ji hev dixist û ji nuhde kontrol dikir.

Bi hezaran gund dişewitand, bi mîlyonan gundîyê kurd bi darê zorê dida koçberkirin. Jibo bajerekî mîna Licê hilweşîne, li Albayê xwe Bahtîyar Aydin sûkast kirin. Bi tank, top û firokan Lîcê bombebaran kirin û seranser rûxandin.

Di heman demê de, ji bo dengekî cîhê derneyê û nîjadperestî û êrîşkariyê li nav civaka tirk xurtir bikin, hêzên dewletê tevkujiya li Sîwasê ya Otêla Madimakê plan kirin.

Ev tevkujî ro-li-nîvro, li ber çavê hemû cîhanê û di bin çavdêrîya hêzên dewleta tirk de hat kirin.

Em wê demê li hefsxana Aydinê diman. Em wek hemû rêxistinên kurdan û yên çepgirên tirk, me rewş bi eşkereyî zanibû.

Him ji bo vê qetlîama li Sêwasê û piştre di cotmehê de ji bo şermezarkirina bûyera Licê me daxuyanîyên çapemeniyê dan û em ji bo her yekê pênc rojan ketin greva birçîbûnê.

Wek tê hişê min jibo çapemenîyê me bi qasî du-sê rûpelan nivîs nivîsand û wek berpirs û nûnerên rêxistinên kurdan û yên çepgirên tirk, me ew daxuyanî îmze kir.

Me daxuyanî bi rêya qardiyanekî ji çapemenîya kurdan û ya çepgirên tirkan re şand.

Piştî bi salekî ew nivîs di arşîva Ozgur Gundem buroya Îzmîrê de hat girtin û di derbarê me de doza "Propaganda Terorê" vekirin. Jixwe ji ber van çalakiyan du sal mafê min yê hefsa vekirî jî nedan min. Bi ser de min sirgûnî hefsa Elbîstanê kirin.Dema ez li hefsxana Elbîstanê bûm, dozger îfadeya min girt.

Dozger, pirsa pêşî ji min kir, got: "ma ez faşîst im?" Min jî jê re got: "jibo ku tu dozgerekî vê dewletê ye, erê tu faşîst î; lê ne tenê faşîs, tu û dewleta te li vir, li Kurdistanê dagîrker û kolonyalîst in jî!" Got çawa? Min jî ji şerê cîhanê yê yekem destpêkir û heta avabûna Komara Tirk, dagîrkirina Kurdistanê, qanûnên tunekirin û asîmîlasyona kurdan, serhildan û berxwedanên li Kurdistanê, tevkujî, darvekirina serok û rêberê kurdan, koçberkirin û wêrankirina Kurdistanê jê re got. Wî jî heta dawîyê li min gohdar kir.

Dema sûbay û leşkeran ez vegerandim hefsxanê, di rê de, sûbayê ku ez dibirim hefsê, got: "Ez çavê te bixum, tiştên te goti tev rast bûn.

Ez "laz" im, li hember me jî heman tişt kirin! Tê bêje çima tu ji wan re leşkerîyê dike? Bawer bike, ji xizanî û bêkêrîya me ye!"

Jibo hefsxana Elbîstanê kirin girtîgeh û me nehîşt girtî ji hin rêbazên wan re serî deyne û me wan xistin girevê. Em jî 17 rojan bi wan re ketin gireva birçîbûnê, loma em sirgûn kirin, ez jî şandim hefsa Manîsayê.

Li Manîsayê ez birme dadgehê. Li dadgehê dadger, îfadeya min ya ku min dabû dozger pirsî û got: "ma ev îfade ya te ye û tu li van daxuyaniyên çapemenîyê dibî xwedî?'' Min jî got: ''Erê!''.

Ez ne şaş bim dadger jin bû. Cezayê min berê amade kiribû. Got: "jibo her dozekê neh meh girtîgeh û sed hezar cezayê pere.

Her du dike 18 meh cezayê hefsê û dused hezar cezayê pere; ku tu cezayê pere nede jî ji dêbla wê tê hefsê razê!"

Jixwe parêzerê min jî tune bû. Lê ji ber ku dozek komî bû, hineka îtîraz kiribû, doz çû Yargitayê. Jiber ku ew ne cezayê giran bû, ji bo vê cezayê biryara girtinê nedabûn. Di vê navbênê de cezayê min yê hefsa muebbetê bi şert, xelas bû û ez berdam.

Berîya ku min berdin, ez birim nufûsê û şubeya leşkerîyê. Nasnameyek nuh dan min û kaxeta çûna leşkerîyê dan min. Gotin: "di nav bîst rojan de divê tu here Şûbeya Leşkerî ya navçeya xwe û sewka xwe çêke!"

Dema ez derketim, min zanibû ku biçim leşkerîyê û cezayê min ji alî dadgeha bilind bêt qebûlkirin, wê min ji wir bibin hefsxanê.

Pêşî min xwe ji leşkerîyê kir firar û ez li bendê mam heta cezayê min hat erê kirin.
Ez jibo neçim leşkerîyê derketim derveyî welat. Ez li Hollanda ji ber van herdu cezayan rûniştim.

Belê, ji ber protesto kirin û şermezerkirina qetlîama ku di 2yê temûza 1993yê de, li otêla madimak a li Sêwasê rûdabû, min cezaya hefsê xwr.

Lê belê, wan qatîlên ku 33 rewşenbîr û 2 xebatkarên otêlê li ber çavên dinyê şewitandin û wan qetil kirin tu ceza nexwarin, doza wan ket!.



HAYAL HABER

GERÇEĞİ UNUTMA, GELECEĞİ AYDINLAT!

GÜNLÜK TARAFSIZ HAYAL GAZETESİ 2 TEMMUZ 1993 FİYATI: 2 TL

TÜRKİYE TARİHİNİN EN ACI GÜNLERİNDEN BİRİ

2 TEMMUZ 1993

MADIMAK OTELİ

UNUTMADIK, UNUTMAYACAĞIZ!

Sivas'ta Pir Sultan Abdal Şenlikleri nedeniyle kente gelen aydın, yazar, şair ve sanatçıların konakladığı Madımak Oteli, kalabalık bir grubun saldırısı sonucu ateşe verildi.

OTELDE BULUNAN 35 KİŞİ HAYATINI KAYBETTİ!

33 aydın, yazar, şair ve sanatçı ile 2 otel çalışanı yaşamını yitirdi. Olaylar sırasında saldırgan kalabalıktan 2 kişi hayatını kaybetti. Toplam can kaybı: 37

2 TEMMUZ SİVAS KATLİAMI

MADIMAK OTELİ

YÜREKLERİMİZDE SÖNMEYEN ATEŞ!

IŞIKLARI YOLUMUZU AYDINLATSIN...

HAYATINI KAYBEDENLERDEN BAZILARI

ADALET HÂLÂ BEKLENİYOR!

UNUTMA! UNUTTURMA!

2 TEMMUZ 1993 SADECE BİR TARİH DEĞİL, İNSANLIK SINAVIDIR!

"YAKILAN SADECE BİR OTEL DEĞİLDİ; DÜŞÜNCE, SANAT VE İNSANLIK YAKILMAK İSTENDİ."

UNUTMADIK! UNUTMAYACAĞIZ! HESAP SORULMADIKÇA BU YARA KANAMAYA DEVAM EDECEK!

# Civaka Sivîl, Asoyên Siyasî û Guhertina Berdewam di Rewşa Piştî-Şer a Îranê de



N. Sefiye Xalidî

**Ji Şer ber bi Veguhêzînê Ve:**
Di rewşa niha ya Îranê de piştî şerê dawî yê di navbera Îran, Îsraîl û Amerîkayê de, welat ketiye qonaxek ji nû ve pênasekirina hêviyên siyasî, zêdebûna zexta aborî û zêdebûna nezelaliyê li ser pêşerojê. Vê rewşê di heman demê de du meylên nakok di nav civakê de çalak kiriye: ji aliyekî ve, qelsbûna binesaziya aborî û zêdebûna zextên li ser debara jiyanê; û ji aliyê din ve, nîqaşeke giştî ya zêde di derbarê îhtîmala guhertina siyasî di pêşerojê de. Di çarçoveyek wisa de, yek ji pirsgirêkên sereke derketina holê ya baweriya ku guhertina siyasî tenê bi rêya krîzên din, hilweşîn an şerên pêşerojê mimkun e, di nav beşên civakê de ye. Ev gotar îdia dike ku her çend têgihîştinên weha wekî îfadeyên bêhêvîtiyê têne fêm kirin jî, ew - li gorî teoriyên veguherîna siyasî û ezmûna dîrokî - bi gelemperî kapasîteya civakî ya kolektîf qels dikin û rê li ber avakirina guhertina siyasî ya domdar û endojîn digirin.

Di wêjeya zanistên siyasî de, bi taybetî di lêkolînên li ser veguherînên demokratîk de, guhertina siyasî ya domdar bi gelemperî encama tevlîheviyek ji sê faktorên bingehîn e: yekem, nerazîbûna civakî ya berfireh; duyem, avakirina torên sivîl û civakî yên rêxistinkirî; û sêyem, hebûna asoyek siyasî ya alternatîf a pêbawer û xeyalî. Di çarçoveya niha ya Îranê de, faktora yekem - nerazîbûna civakî û zexta aborî bi eşkereyî heye û piştî şerê dawî jî zêde bûye. Lêbelê, du faktorên dawîn - rêxistina civakî û hebûna asoyek siyasî ya zelal bi pirsgirêkên girîng re rû bi rû dimînin. Di rewşek wusa de, heke gotara serdest ber bi hêviyên guhertinê yên ji şer an hilweşîna derveyî ve biçe, encam muhtemelen dê qelsbûna van her du pêkhateyên bingehîn be.

Ji perspektîfa sosyolojiya siyasî ve, yek ji xetereyên sereke di civakên piştî şer de, pêkhatina tiştê ku dikare wekî "hêviya pasîf a guhertinê" were binavkirin e. Di vê rewşê de, beşên civakê dest pê dikin ku bawer bikin ku veguherîna siyasî ne encama çalakiya kolektîf, rêxistina sivîl, an reformên gav bi gav e, lê belê encama şokên derveyî yên wekî şer, destwerdana biyanî, an hilweşîna sîstemê ya ji nişka ve ye. Her çend ev celeb bawerî dibe ku hestek hêviyê ya demkurt çêbike jî, di demek dirêj de ew bandora têgihîştî ya civakê kêm dike û beşdariya sivîl kêm dike. Bi gotineke din, civakek her ku bêtir li benda rizgariya derveyî be, kapasîteya wê ya çêkirina guhertina navxweyî ewqas qels dibe.

Ezmûnên dîrokî yên welatên cûrbecûr nîşan didin ku tewra di şert û mercên piştî şer an krîzên giran de jî, guhertinên siyasî yên domdar tenê dema ku civak karibûn torên xwe yên sivîl biparêzin an ji nû ve ava bikin çêbûne. Bo nimûne, li çend welatên ku piştî şeran ketine serdemên veguhêz, rola sendîkayên karker, komeleyên pîşeyî, komên xwendekaran û rêxistinên sivîl di veguherandina nerazîbûna giştî bo daxwazên berbiçav û danûstandinbar de diyarker bû. Ev ezmûn nîşan didin ku avakirina "saziyên navbeynkariyê" di navbera dewlet û civakê de yek ji pêşşertên sereke ye ji bo her veguheztinek siyasî ya domdar.

Di rewşa niha ya Îranê de, ji ber zextên aborî yên ji ber şerê dawî û bandora wê li ser binesaziyê, bazarên kar û baweriya giştî, pirsgirêka sereke ne tenê guhertina siyasî ye, lê parastina kapasîteya civakê ji bo çalakiya kolektîf e. Dema ku zexta aborî zêde dibe, gelek kes bi xwezayî pêşîniyên xwe ber bi jiyan û debara kesane ve diguherînin, ku ev dikare beşdariya di çalakiyên kolektîf de bi girîngî kêm bike. Ji ber vê yekê, yek ji erkên herî girîng ên aktorên siyasî û civakî ew e ku di heman demê de hem aliyên aborî û hem jî yên siyasî çareser bikin; bêyî başbûnek nisbî di şert û mercên aborî de an pêşkêşkirina çareseriyên pêbawer ji bo pirsgirêkên debara jiyanê, tu projeyek siyasî nikare piştgiriyek civakî ya domdar bi dest bixe.

Di vê çarçovê de, çalakvanên siyasî divê kêmtir li ser senaryoyên li ser hilweşîn an şerên pêşerojê bisekinin û bêtir li ser ji nû ve avakirina hêviya civakî ya rastîn bisekinin. Hêviya rastîn nayê wateya înkarkirina krîzan; berevajî vê, ew tê wateya peydakirina rêyên gengaz ji bo guhertinên navxweyî. Ev rê dikarin xurtkirina saziyên sivîl, piştgiriya komeleyên karker û pîşeyî, zêdekirina şefafiyetê di daxwazên giştî de, berfirehkirina diyaloga civakî, û xebata ji bo kêmkirina dabeşbûnên civakî di nav xwe de bigirin. Di nêzîkatiyek wusa de, civak hêdî hêdî ji li benda veguherîna derveyî ya ji nişka ve dûr dikeve û ber bi çalakiya kolektîf a rêxistinkirî ve diçe. Hêmanek din a sereke di vê pêvajoyê de mijara "asoya siyasî" ye.



**Di nebûna asoyek siyasî ya zelal de, civak di rewşek rawestayî de dimîne: ne rewşa heyî qebûl dike û ne jî alternatîfek zelal ji bo wê heye. Ev rewşa bêçare yek ji ajokarên sereke yên hilweşîna sermayeya civakî ye.**

Ji ber vê yekê, yek ji berpirsiyariyên bingehîn ên aktorên siyasî ew e ku alîkariya vegotina nîqaşên zelal ên li ser pêşeroja siyasî, aborî û civakî ya welêt bi awayekî ku ne tenê utopîk be, lê di şûna wê de nîqaşbar û hêdî hêdî pêkan be, bikin.

Herwiha, ezmûn nîşan dide ku polarîzasyona siyasî yek ji astengiyên sereke yên li pêşiya veguherînên aştiyane ye. Piştî krîzên mezin ên wekî şer, civak meyla wan heye ku li ser xetên siyasî û nasnameyî pir dabeş bibin. Ger ev dabeşbûn neyên birêvebirin, îhtîmala diyalog û hevkariyê di navbera komên civakî yên cûda de kêm dibe. Di şert û mercên weha de, rola aktorên siyasî dikare kêmkirina retorîka derxistinê û xurtkirina bingeha civakî ya hevpar be.

Di dawiyê de, divê rola Îraniyên ku li derveyî welêt dijîn jî di vê çarçoveyê de bi awayekî realîst were destnîşankirin. Ezmûna dîrokî nîşan dide ku guhertina siyasî ya domdar di serî de di hundurê welêt de ji hêla hêzên civakî yên navxweyî ve tê şekildan, lê rola civakên derveyî di warên wekî belavkirina agahdariyê, piştgiriya sivîl û hêsankirina ragihandinê de ji ku li şûna ajansa navxweyî werin danîn, bi bandortir e.

Di encamê de, di rewşa niha ya Îranê de piştî şerê dawî, civak di qonaxek krîtîk de di navbera du rêyan de ye: rêya yekem veguherîna nerazîbûna civakî bo bendewariya pasîf a hilweşînê an şerên pêşerojê ye, ya duyem veguherîna nerazîbûnê bo çalakiyek kolektîf a rêxistinkirî û gav bi gav e. Delîlên dîrokî û teoriya siyasî destnîşan dikin ku rêya duyem, her çend hêdîtir û tevlihevtir be jî, di dawiyê de rê li ber encamên aramtir û kêmtir biha vedike. Ji ber vê yekê, erkê herî girîng ê aktorên siyasî di vê çarçoveyê de ne ew e ku bendewariyên krîzên kûrtir zêde bikin, lê belê beşdarî ji nû ve avakirina kapasîteya civakî, xurtkirina saziyên sivîl û afirandina asoyên rastîn ji bo guhertina endojîn e.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Rêjîmê malbatên Şehîdan gazî kirne Îtlaatê û sivkatî bi wan kir



Bi derbasbûna çar rojan bi ser şehîdbûna 6 pêşmergeyên Hizba Dêmokrata di şerê ligel hêzên Spaa Pasdaran a terorist de, hejmarek ji malbatên Şehîdan li Pîranşarê ji bo Îdareya Îtîlaatê ya vî bajêrî hatin gazîkirin û tevî bêrêzî û gefxwarinê, bi zorê telefona hejmarek ji wan zeft kirin da ku wêneyên «Xamenêyî» di torên wan ên civakî de belav bikin.

Çavkaniyeke agahdar tevî piştrastkirina vê nûçeyê got: Roja şemî 13ê Pûşpera 1405an, hejmarek ji malbatên pêşmergeyên Şehîdbûyî yên Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li bajarê Pîranşarê, ji bo Îdareya Îtîlaatê ya vî bajêrî hatin gazîkirin û tevî bêhurmetî li wan, bi zor û gefxwarinê ji wan malbatan hat xwestin ku telefona mobîl û remza wekirina Gûşiyên telefona xwe bidne destê hêzên ewlehiyê.

Dema ku malbat ji vê zora hanê xwe dane paş, hêzên ewlehiyê telefona mobîl a hejmarek ji wan bi zorê ji wan wergirtine û di torên wan ên civakî de dest bi belavkirina wêneyên «Xamenêyî» kirine.

Hemî xelkê azadîxwaz ê Kurdistanê baş dizanin ku rêjîma dije Kurde komara Îslamî mijûlê çi core pîlanên qirêj e ku letmê li kerameta malbatên serbilinde Şehîdan bide, lewra bê guman di vê pîlanê de jî serşorî bo dijmin û dagîrkerê Kurdistanê û terorîstên rêjîmê ye.

## Keça Wezîr Rehîmî: Bibin dengê bavê min û tev kolberan

Soma Rehîmî, keça Wezîr Rehîmî, ew kolberê temen 57 salî yê ku roja 12ê Pûşperê li sînorê Newsûdê bi guleyên hêzên rejîmê canê xwe ji dest da, bi belavkirina vîdyoyekê daxwaz kir ku xelk bibin dengê bavê wê û kolberên zilm lêkirî.
Soma bi amajekirin bi vê yekê ku bavê wê di demekê de gule lê hatiye reşandin ku ti barek qaçax pê re nebûye û bi neheqî hatiye kujtin.



Got: "Ez keça biçûk a wî mêrî me ku henga merzî rehm pê nekir. Ji ber giraniya birînê, her li wê derê canê xwe da û duh bi destê xwe min ew bi axê spart."
Navbirî daxwaz dike ku vîdyoya wê bê belavkirin da ku raya giştî ji vê tawankeriyê agahdar bibe û dibêje: "Ez dixwazim bibim dengê hemû wan kolberên ku di bêdengiyê de tên kuştin."

Wezîr Rehîmî, bavê pênc zarokan û xelkê gundê "Mêsûrawî" ser bi bajarê Şaho bû ku ji ber hejariyê û bêkariyê, 20 sal bû ji bo dabînkirina debara jiyana xwe karê kolberiyê dikir.

Li gorî amara rêxistinên mafên mirovan, di heşt salên borî de nêzîkî 2 hezar kolber li sînorên Rojhilatê Kurdistanê hatine kujtin an jî birîndar bûne, ku zêdetirî ji sedî 70yê wan bi teqeya rasterast a hêzên rejîmê bûye.

## Rêjîma Îranê Tenê li mehekê de aliyê kêm 109 girtî bidarvekirine



Li gorî raporta rêkxistina Mafên Mirovî, tenê li heyama mehekê de, anku meha Juenê de aliyê kêm 109 girtî li seranserê Îranê de hatine bidarvekirin.

Rêkxirava Mafê Mirov a (Hengawê) li raportekê de behs ji vê kir ku li meha derbasbûyî de, sizaya bidarvekirina aliyê kêm 109 girtiya ji wan 5 girtiyên siyasî li girtîgehên cuda ên rejîma Komara Îslamiya Îranê de hatine cîbicîkirin.

Li gorî raporta Hengawê, ew amar bi berhevdanîn bi heyama zemenî a sala derbasbûyî, aliyê kêm 10 hallet beramber bi %10 zêde kiriye.

Li gorî heman raportê, li heyama meha Jûena 2025an de, 99 girtî ji aliyê Navendên serkutker ên rejîmê ve hatibûne bidarvekirin, lê di heman meha Îsal de aliyê kêm 109 girtî hatine sêdaredanê.

# Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (521)